


Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 8**

# Ayînên Rojavayê Asiyayê û Islametî

Diyardeya ayînan di dîroka mirovayetiyê da gelek kevine, û ew di her demeka dîroka da herdem li gor asta hişyariya her civakekê bû. Em li ser vê mijarê bi berfirehî di xeleka "**Xwedawend û Siyaset bi dirêjahiya Dîrokê**" da rawestiyabûn. Bi gelemperî, di babeta ayînan da sê rastiyên balkêş hene:

**Rastiya Yekem**: Peyadabûna ayînên *yekxwedayî* (yên ku bi hebûna yek xwedayî bawer dikin) wek *Yezdanî, Cihûtî, Zerdeştîtî, Kirîstiyanî, Manewî* û *Islametî* hemû li *Rojavayê Asiyayê* bûn. Li Ewropayê, em peydabûna ti pêximberan nabînin. Di dema kevin da ku welatê Yûnan navenda şaristaniya ewropayî ya here li pêş bû, em peydabûna pir fîlosofan dibînin.

Piştî wê em dibînin ku *Cihûtî, Kirîstiyanî û Îslametî* ji *Rojavayê Asiyayê* derbasî Ewropa dibe. Gelo pêwendiya vê yekê bi wê mijarê ra heye ku bi gelemperî ramana *Sofîtî-Efsanewî* li ser bîreweriya rojhilatî serdar bû û bêhtir ramana *Aqilmendî-Zanistî* li ser ya yûnanî serdar bû?

Pirsa din jî ewe ku gelo peydabûna ayînên *yekxwedayî* li Rojhilat pêwendiya xwe bi peydabûna dewleta navendî ya gewre ra heye? Di herdu rewşan da jî em dibêjin ku bersiv erênî ye.

**Rastiya Duwem:** Li *Rojavayê Asiyayê* çar şêweyên têvel yên ayînên *yekxwedayî* peydabûn:

**1- Ayînên mêşin û ne êkspanzîv(expansive):** Ev şêweyê ayînan bû xwediyê taybetmediyeka niştîmanî-neteweyî. Li gor van ayînan *Xwedayê Yekane* ji bawermendên van ayînan ra nabêje ku herin vê ayînê li ser hemû gelên cîhanê belav bikin. Di van ayînan da xwekuştin (cihad), talankirin û bikaranîna darê zorê ji bo belavkirina wê li nav hemû gelan nîne. *Ayîna Yezdanî (Ezdayî)* û neviya wê Zerdeştîtî baştirîn nimûne ne ji bo vî şêweyê ayînan. Ev herdu ayîn di nava gelên Ariyanî-Rojhilatî da ji sînorê Çînê heya bi Kurdistanê belav bûn. Di pirtûka pîroz *Avesta* ya *Zerdeştîtiyê* da ti navtêdanek nîne ku mirovan ji bo belavkirina ayînê bike leşkerê xwekuj û wan bişîne talankirina welatên gelên din, bi soza ku ewê bi vê yekê *bihuşta bala* qezenc bikin. Ji ber vê sedemê *Zerdeştîtî* bi awayekî giştî tenha di nav gelên *Ariyanî-Rojhilatî* da bi sînor ma. Tenha beşekî biçûk ji gelên Turk - bi sedema cîrantiya wan ji gelên Ariyanî ra - ev ayîn wergirt. Tenha di dema *Emperatoriya Farisî* da ku *Zerdeştîtî* bû îdeologiya wê, aliyê êrişbaz û şervanî têda xuyakir.

**2- Ayînên mêşin û êkspanzîv (*expansive*):** Ayîna *Kirîstiyanî* û *Manewî* du nimûneyên diyarin ji bo vî şêweyê ayînan. *Kirîstiyanî* xwedî taybetmendiyeka *cîhanî-tevayî* ye. Ew doza hezkirin û aştiyê di nava mirovan da dike bêyî ku darê zorê bi karbîne. *Pêximber Îsa* ti leşker ji bo şer û talanê amade nekirin ku ayîna wî bi zora şûr bê belavkirin. Layangir û alîgirên wî li pir welatan belav bûn û ketin wê bizavê ku baweriya mirovan bi vê ayînê bînin; ew pir

caran ji bo baweriya xwe dihatin perçiqandin û îşkenceyên giran didîtin. *Ayîna Kirîstiyanî* tenha taybetmendiya êrişbaz stand gava ku ji bo emperatoriyên *RomanÎ* û *Romî-Bizantî* bo îdeologiya fermî.

Her wisa jî ayîna *Manewî*. *Pêximberê Ariyanî Manî* hat ku rastiya *Zerdeşt, Buza û Îsa* destpêkiribû temam bike. Wî xwe wek pêximberê ronahiyê ji bo seranserê mirovatiyê da naskirin. *Pêximber Manî* doza aştiyê, perestina Xweda, xwarina xêr û bêrên surişte bi qinyad, xwedûrxistin ji tundî û zorê, xwedûrxistin ji xwarina goşt û mehirkirina jinan. Doza wî dozeka cîhanî bû ji bo hemû mirovan; wî bawermendên xwe dişandin nava hemû gelan, lê ew nekirin leşker ku bi navê Xweda êrişan bibin ser gelên din.

**3- Ayînên êrişbaz, lê ne cîhanî:** *Ayîna Cihûtî* nimûneya diyar ya vî şêweyê ayînane. *Cihûtî* li ser wê baweriyê hatiye avakirin ku Xweda herêma navbera çemên *Nîl* û *Ferat* ji bo pêximber *Ibrahîm* û dûndayên wî veqetandiye. Ji lewra, ji mafê gelê Îsraîle ku talanê bibe ser gelên ku di vê herêmê da dijîn, vê herêmê ji wan bistîne û bike milkê xwe. Hemû pêximberên *Cihûtiyê*, bi taybetî jî *Mûsa, Dawûd û Sulêyman,* hewldane ku vê armancê bi cih bînin.

**4- Ayînên êrişbaz û cîhanî:** Wek nimûne ji bo vî şêweyê ayînan *Îslametî* ye. Ew li ser wê baweriyê hatiye avakirin ku *Îslametî* ayîna yekane ye, ya ku li ba Xweda tê pejirandin û hemû ayînên din ji rêya *yekxwedayiyê* derketine. Li gor vê ayînê, Xweda pêximber *Muhemed* ji bo tevaya mirovariyê şandiye **{وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا كَافَّةً لِّلنَّاسِ بَشِيرًا وَنَذِيرًا }**[1].

Islametî - wek ku di Qur'anê da hatiye gotin - ne tenha ji bo mirovan, lê ji bo cîhana mirov û cinan jî (li Qur'ana Pîroz, li Sûreyê Cinan binêre). Li gor vê ayînê, divêt *Îslametî* li seranserê cîhanê bête belavkirin û alaya (*Allahû Ekber*) divêt li her derê bipirpire û dewleta *Xilafeta Îslamî* serdariyê li hemû gelan bike; Xweda milkiyeta vê cîhanê daye perestvanên xwe yên qenc û Misilman ew perestvanên Xweda yên qencin **(وَلَقَدْ كَتَبْنَا فِي الزَّبُورِ مِن بَعْدِ الذِّكْرِ أَنَّ الْأَرْضَ يَرِثُهَا عِبَادِيَ الصَّالِحُونَ)**[2].

**Rastiya Sêhemîn:** Îslametî ayîna yekane ye ku xwediya taybetmediyeka cîhanî û bikaranîna darê zorê ye. Li gor vê ayînê, belavkirina Îslametiyê li cîhanê pêşî bi rêya aqilmendî û pendên qence. Lê heger aqilmendî û pendên qenc bê encam man, hîngê şer û talan pêwîste. Ew di wê baweriyê da ne ku mirovên li seranerê cîhanê du beşin: Beşek *alîgirên Xweda* ne (ew Misilmanin) û beşê din *alîgirên Îblîsin* (ew jî yên ne Misilmanin). Serkeftin ji *alîgirên Xweda* ra ye. Xweda gotiye: Alîgirên Xweda yên serkeftî ne ( **فَإِنَّ حِزْبَ اللّهِ هُمُ الْغَالِبُونَ**)[3] .

Daku Misilman biserkevin, divêt ew xwedî hêzeka bi zor û tund bin ku dijninên xwe pê bitirsînin. Xweda gotiye: Heya ji we tê, divêt hûn hêz bicivînin û hespan amade bikin ku hûn dijnimên xwe û dijminên Xweda bitirsînin ( **وَأَعِدُّواْ لَهُم مَّا اسْتَطَعْتُم مِّن قُوَّةٍ وَمِن رِّبَاطِ الْخَيْلِ تُرْهِبُونَ بِهِ عَدْوَّ اللّهِ وَعَدُوَّكُمْ**)[4] . *Pêximber Muhemed* jî gotiye: Bi tirs û sawîrê ez wek çûyîna mehekê bi ser ketim (**نُصِرْتُ بِالرُّعْبِ مَسِيرَةَ شَهْرٍ**)[5]. Erê, Mirovê Misilman divêt xwe ji şerê bo ayînê nede paş. Xweda dibêje: Di rêya Xweda da can û malê xwe feda bikin ( **وَجَاهِدُواْ بِأَمْوَالِكُمْ وَأَنفُسِكُمْ فِي سَبِيلِ اللّهِ**)[6] .

**Rastiya Çaremîn:** Di Îslametiyê da kesên ne Misilman sê beşin, û ji bo her beşekî hukmekî taybet li gor *Şerî'ta Îslamî* heye:

**1- Kesên kafir (nebawrmend):** Ew kesin ku hebûna Xweda nasnakin. Li gor *Hukmê Şerî'tê* divêt yan ew bibin Misilman, yan jî şer li dijî wan bê kirin. Heger bûn Misilman, mafê

wan mîna mafê hemû Misilmanane. Lê heger nebûn Misilman, divêt bi tundî zor bê bikaranîn û kuştina wan erkeka rewa ye (şer'î ye) ku divêt bi her awayî bi cih bê. Xweda gotiye: "Gelî bawermenan! Divêt hûn şerê nebawermendan bikin û bila ew tundî û zorê ji we bibînin"( يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُواْ قَاتِلُواْ الَّذِينَ يَلُونَكُم مِّنَ الْكُفَّارِ وَلِيَجِدُواْ فِيكُمْ غِلْظَةً) [7]. *Pêximber Muhemed* jî gotiye: Ferman ji min ra hatiye ku ez şerê xelkê bikim heya ku dibêjin: "Ti Xweda nîne ji bilî Xweda" (أُمِرْتُ أَنْ أُقَاتِلَ النَّاسَ حَتَّى يَقُولُوا لَا إِلَهَ إِلَّا اللَّهُ) [8].

**2- Kesên dubawermend (muşrîk):** Ew kesin yên ku bi hebûna hin xwedayên din li nik Xweda bawerdikin ku serdariya gerdûnê û jiyana mirovan bi wî ra parvedikin, ew perestiyê ji wan xwedawendan ra dikin. *Hukmê Şerî'tê* li ser van mîna hukmê li ser nebawermendane. Ew jî ewe ku ew yan *Îslametiyê* yan jî kuştinê hilbijêrin. Ferman ji Misilmanan ra heye ku van kesên dubawermend li her derê bikujin. Xweda gotiye: "Heger mehên heram derbas bûn, hûn li kû rastî dubawermendan hatin, wan bikujin"( فَإِذَا انسَلَخَ الأَشْهُرُ الْحُرُمُ فَاقْتُلُواْ الْمُشْرِكِينَ حَيْثُ وَجَدتُّمُوهُمْ) [9].

**3- Kesên xwedî pirtûkên pîroz:** Ew jî *Cihû, Kirîstiyan, Sabîe (Mendaî) û Mecûsin(Zerdeştî)*[10]. Ev kes bi hebûna yek xwedayî bawer dikin. *Hukmê Şerî'etê* derbarê van da ewe ku rewa ye ew li ser ayîna xwe bimînin, lê bi mercê ku ew ji *Dewleta Îslamî* ra serê xwe daxînin, ew bac û salaneya li ser erd û mirovan her sal bidin, ew herdem stûxar û bindest bin. Xweda gotiye: "Şerê wan kesan bikin, ewên ku bi Xweda û bi *Roja Paşî* bawer nakin, tiştê Xweda û Pêximberê wî heram kiriye ew heram nakin û bi ayîna mafdar nagirin, ewên ku pirtûk ji wa ra hatiye, heyanî ku bac û salaneyan bi stûxwarî li ser dest didin” ( قَاتِلُواْ الَّذِينَ لاَ يُؤْمِنُونَ بِاللّهِ وَلاَ بِالْيَوْمِ الآخِرِ وَلاَ يُحَرِّمُونَ مَا حَرَّمَ اللّهُ وَرَسُولُهُ وَلاَ يَدِينُونَ دِينَ الْحَقِّ مِنَ الَّذِينَ أُوتُواْ الْكِتَابَ حَتَّى يُعْطُواْ الْجِزْيَةَ عَن يَدٍ وَهُمْ صَاغِرُون)[11].

Gava *Erebên Misilman* dest bi êriş û talanên xwe kirin, piraniya Kurdan Zerdeştî bûn, yanê ew xwedî pirtûk bûn, ew ne nebawermend û ne jî dubawermend bûn. Lê tevî wê jî, Ereban warên wan talan kirin (wek ku me di xeleka derbasbûyî da gotibû); ew bi darê zorê xistin bin serdariya *Dewleta Erebî Îslamî*. Gelo çima û çawa wisa bû?

Emê di xeleka dahatî da li ser vê yekê rawestin.

**Jêder**

---

1 Sûreyê Sebe', ayet 28.
2 Sûreyê Enbiya',ayet 105.
3 Sûreyê Al-Maîdeh, ayet 56.
4 Sûreyê Al-Anfal, ayet 60
5 Al-Buxarî, Buxarî rastlirî, 1992, 3/334
6 Sûreyê Al-Tewbeh, ayet 41.
7 Sûreyê Al-Tewbeh, ayet 123.
8 Al-Nisaî, Suneyên Nîsaî, 1980, 5/6.
9 Sûreyê Al-Tewbeh, ayet 5.
10 Sûreyê Al-Hec, ayet 17.
11 Sûreyê Al-Tewbeh, ayet 29.